Newroz Hejmar (72) Rûpel (3) Sibat 2007z – 2618k

Li Cindirêsê rojeke xemgîn

Ew roja xemgîn , 20,2,2007an , roja jinavmebarkirina, lawê Kurd , lawê Cindrêsa delal (Efrîn), kemal Mihemed kurê Elî (Kemalê Şetê) bavê Elî bû . Ew roja xatirxastin û silava dawiyê li wî xebatkar û welatperwerê hêja û bi nav deng bû .

Bavê Elî li sala 1939an ji dayik bû , di 1974an de , derbasî nav refên partiya demoqrat a Kurd li Sûriyê (Elpartî) bû û ta sala 1984an bi coşke mezin xebitî . Li sala 1984an , ew ji aliyê hêzên ewlekariyê ve , hate girtin

Piştre û ta vê dawiyê ew endama Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , refê dudiyê bû , taku , bû endama encûmana hevbend a Kurd li Kurdaxê . Xebatkarê me xebata xw ta roja dawî berdewam kir.

Li 20.2.2007an xelkê Cindirêsê , meriv û xisimên wî , heval û dostên partiya Yekîtî , û bi beşdariya şandek ji Hevbenda Kurd li Sûriyê û hinek heval ji partiyên Tevgera Kurd li Sûriyê , cenaza bavê Elî ji mal bi derxistin û di çarşiya cindrêsê re , berve goristanê bi rêxistin . Ji mal ta goristana cindirêsê , koma niştîman a folklorî bi cilên xwe yên rengîn di pêşiya cenazê nemir de , bi dest wan de , di pêşî de baxek gul û çîçek bi navê H.K.S , dûvre du bax gul bi navê P.Y.D. K. S û di nav herdu baxan de , wêneya bavê Elî hildayî û li piş cenazê xebatkarê me ,ew cemawerê mezin , heval û dostên wî berve goristanê dimeşiyan .

Hêjaye bê gotin ku , ji mal ta goristanê , hemî firoşgehên li ser rê , ji bo rêzgirtina nemir deriyê xwe girtin .Ev bi xwe jî li ba xelkê Cindirêsê şana toreyeke civakî ne hindike hêvî ewe hemî herêmên dî yên Kurd wê sinciyê werbigirin . Piştî gîhana goristanê û veşartina terma bavê Elî, sê gotin li ser hatin xwendin . Yek bi navê Encûmana giştî ya Hevbenda Kurd li Sûriyê , ya dudiyê bi navê Encûmana Hevbena Kurd li Kurdaxê , û ya sisiyê kurê nemir Avokat Elî got . Hersê gotinan kar û xebata nemir ji haziran re diyarkirin û dan xuyan ku , gelê Kurd tucarê xebatkarê weha ji bîr nake.

Ji 20an ta 23an li bin konê sersaxiyê , kurê nemir mamoste Elî , merivên wî û heval û dostên P.Y.li Cindirêsê ji sibê ta dawiya êvarê , pêşewaziya ne kêmtirî 20000kes ji xelkê Cindirês û derdora wê , ji hemî deverên dî yên Efrînê û şandên sersaxkirinê ji Cezîrê de bigir , di Kobanî û Reqê re derbas be ta digihê bajarê Helebê dikirin .

Hemî şandên P.Y, ku dihatin bin konê sersaxkirinê , gotinek bi navê P.Y.D.Ks li ser giyana nemirê hêja digotin . Di hemî gotinan de li ser giringiya xebata mirov û Tevgera Kurd di ber miletê Kurd de , dihate rawestan .

Bi navê komîta rêvebir û xwendevanên rojnama Newrozê , bila serê xwedî , heval , hogirên bavê Elî saxbe û ciyê wî bihuşta bilind be .